

FANTEZIYA REXNEYÎ

PÎŞKA -2



Hoşeng Şêx Mihemed

DESPÊKEK BO ROHNKIRINÊ: REXNE WEK FANTAZIYA

Rexne di rewşenbiriya kurdî de, bi taybetî li deverê, heta niho nebûye fantaziyek, belkî di nav ew bêkarî û gendeliya hizrê de, neşê bibîne rexne sadetirîn û rontirîn û selmawtirîn astê de, rexne hete heta vê gavê jî jêk vavêrtina baş û xirabiyên tekstêkî bibe, yan diyarîkirina ciwanî û kirêtiya berhemekî bibe, yan nîşandana hêz û bêhêziya nivîserekêbe, yan hêj xwendina tekstên kurdî bibe bi polînkirina komediyên wek: "realîteya rexneyî û realîteya sosyalî û xwe mijûlîkirin bi pozetivîstiyetê" eve rexne di baştirîn astê xwe de, bûye geryanek li "manayan, yan ciwanîyê", di baştirîn ast de bûye îdiayek bo cewaziya xwedan û têgehiştinan di nabera "1-nivîser û xwînerî de, 2-xwîner û xwînerî de," yan rave û qabilî pirsyarkirin û gumanî nebe. Tenanet heta vê gavê jî rexne neşiyaye pirsyar bike erê "akademîbûn" bo me dê çi bike û dê çi bibe? Heger eve nebêjn berî vê gavê bo me çi kiriye û çi bûye? Lê pirsyara min di vê derê de ew nîne ez bibêjim rexne, guman û pirsyarên xwe weha arasteyî akademîbûnê bike. Çinku bo min akademiya tiştek dine û cewaze li gel ew rûha zanko û piraniya nivîseran wek pîroz pê berê xwe didinê. Pirsyara min ewe: bo çî têgehiştina me bo akademiya û rexneyî nahête guhorîn? Anku pirsyar ew nîne akademîbûn ne li Kurdistanê li cihên din; çawa hatiye guhortin? Lê pirsyar ewe; li Kurdistanê bo çî nahête guhortin?

Berî wî jî aya rexne di rewşenbiriya kurdî de bo çî çênebûye? Bo çî nahê wergirtin? Bo çî nahê guhortin? Berî wan pirsyaran jî divê bipirsin: aya rexne heger di rewşenbiriya kurdî de hebe jî aya bûne yan mahiyet? Heger em bizivîrîne ser "Sarterî " û teza wî li gor hebûn û çiyetiyê di vê derê de bi meremek din bi kar bihînin, dişên bizanibin ka rexneya kurdî û bi taybetî li deverê şiyaye bibe hebûn, sêta, piştî wî di mahiyeta wî vekolin? Ez bawerim ku rewşenbiriya kurdî tijiyê ji tekstên edebiyên "baş, ciwan, pirman, mezin û giring" lê rewşa rewşenbiriya kurdî neşiyaye, rexnê damezirîne, hokarên serkî yên damezirandina rexnê jî pitir girêdayî rewşa rewşenbiriya kurdiye: anku rohnîtir bibêjn girêdayî arîşeyên rewşenbiriya kurdiniya ji wan arîşeyan:

- 1- Nebûna tîwirên rexneyî û felsefî û zanistî wek çawan li rojava bialqiniyeta Kant dest pê kir û heta gehiştîye helweşîngeriyê.
- 2- Sistema girtiyê rewşenbiriya kurdî di hemû pêkhatyên xwe de, ji dîn û siyaset, edeb, ferheng, exlaq, civak, biha, rewîşt, tîtal û htd.
- 3- Bi karhînan xwendîngehên rexneyên erebî bo demek dirêj ku çî peywendî

bi ketwar û taybetmendiyên rewşenbiriya kurdî nebû.

4- Asoya xeyal û hizreka nivîsînê bi giştî û rexneyî bi taybetî ku heta vê gavê jî sinûrdare.

5- Derbaz nebûn ji realiteya civakî, siyasî, aborî, ehlaqî û htd... di tekstê de.

6- Tenbelî û nexwendina tîwerên rexneyî û felsefeyên rexneyî û veguhastina wan metoda bo rewşenbiriya kurdî.

7- Tirs û newêriyan bo rûbirûbûn li gel tekstan û nivîseran.

8- Tohmet çêkirin, kirêtkirin, retkirin û pîskirina her karek rexneyî ku medh û destqutan nebe.

9- Nebûna îradeyeka rexneyî di nav take kurd bi giştî û nivîseran bi taybetî û tekstên rexneyî.

10- Diyarînekirina rol û egerê rexne û rexnegirî di pirosesek hizrî ya felsefî yan zanistî tiwerî.

11- Newêriyan û cûret egerin yan dirk nekirin bo bikarhînana fanteziyan di rexnê de, eve û renga gelek egerên dî jî hebin û xwînerî hêja ji min çêtir bizane, lê diyare jî ew hokarên serî jî dîsan bi dehan û sedan pirsyaran di serî me de çêdikin û bo wan hokaran jî pêwîste em li hokarên wan hokaran bigerin. Her bo nîmone bo çî sistema rewşenbiriya kurdî girtiye? Pirsyareke û me dibite berderazîna deriyan pirsyaran gewre û giring li dor pêkhatiyên rewşenbiriya kurdî, renga jî ew rêbaz û metodên me di pêşekiya perwerdeyî de baskirin. Alîkariyên bê ku em bişên hindê bersivên lojîkî û maqûl peyda bikin yan her bo nîmone em dişên bi rêbaz helweşîngeriye di vê çendê de bigehîn ka bo çî xwendîgehên erebî neşiyên rexneyek kurdî damezrînin? Heger me pirsyarên xwe li dor eqliyeta erebî û ew sentiralizma wan kar pê fikir sebarek bi bédengkirina kurdan perwêz dişên encamek baş bide me bê ku em bi giringiya cewaziyê û azadbûnê ji rûhê totalîteriyetê û giştîgîr derbaz bibin.

Ez dibînim nebûna fanteziyayê wek hizrek xelaq û tijî wize di karên rexneyê de, karigeriyek zêde negatîv kiriye ser rewşenbiriya kurdî bi giştî û rexneyî bi taybetî "di vê derê de serinca xwînerî bo doktorên xwe 1-şêir û Xwedê 2-şêir û Şeytan. 3-radîkêşim ku xwendînek fanteziye bo geryan li manayên dî bo şêirê û Xwedê û Şeytanî. Weku karek despêkî û birî "nameyek ji Miryemayê bo..." hatiye nivîsîn, di dûmahiya vî basî da amaje bi wan erdan didim ku lê belav bûyîne.

Fanteziya rexneyî:

Diyare wek sebarek divê bibêjim dema em fantaziya rexneyî pêşber dikin, ku renga bibe metodek xweserî jî, mana wî ew nîne em metodên dî red dikine ve, nexêr belku merema me bi vê rexneyê ewe ku em wizeka li radebeder bo azadiyê tê de dibînin, merema me ewe.

Yekem: Fanteziya wek wizeyek xelaq û hêzek têkşikêner bo tekstê bi karbînin, têşikêndina ew dinyaya tekstê divê berhem bibe, nehêlana kontirola tekstê li ser berhemî, anku çêkirina peywendiyek nû di navbera têkst û berhemî de, di vê derê de renga em bişên ta di wa ast mifayê ji Rolan Bart û dêrîdayî wergirin, lê ew xalê em jê cûda dibin yan pêşdikevin ewe, ku em bi tinê merge nivîserî ranagehînin belku merge têkstê jî radgehînin di berhemî de, ev çende

çend dihête retkirin yan qebûlkirin di rewşenbiriya me de, arîşeyek rexneyî û felsefeyî, heger; xwîner, rexnegir bi têgehiştina partiyane, neşên di astê hizrî û felsefî de di gel pêşberiya min de biguncin yan dijbin, heger neşên giftûgoyek rijd û xemxwerane bo rexneyî di rewşenbiriya kurdî di gel min yan dijî min damezirînin. Eve her çi nebe ez dişêm cewazeyekê rabîgehînim, her wesa fantaziya rexneyî wek wizeyek rexnegiryane pêşkêşî rewşenbiriya kurdî bikim, bêyî ku delîvê bide me dengê perawîzkirî de qeseyên xwe bike.

Duwem: Sewdakirin di gel tekstî wek zemîneyek, ne bo lêgeryan û keşifkirina maneya wek Rolan Bart di kitêba xwe rexne û heqîqet de, dibêje çinkû li cem Bart: "Nûser ne ku bi nûsekanî wek rol ya biha, belku tenayabe yarmetî cûrek agayî û şarezayî axaftin diyar dibe, nûser keseke ku ziman pirsî ew bê û li ziman de li qulayî bigerê ne ku li amrazxwazî ya ciwanî." 9- binêre: Rolan Bart rexne û heqîqet, wergêranî Îsmâil Zira berperê 19-e. anku di vê derê de sereta bi ciyetek dî, mahiyetek dî berê xwe dide tekstî ku ew jî ewe tekst meydanek nîne bo mana û ciwanîyê. Belkû ziman pirsê serekiye di tekstê de, di vê derê de em dişên bibêjîn ew tekstên mebesta wan komeka mana û ciwanîyê ye. Bêyî ku ew li kûratiya zimanî bigrin, pêwîste her destpêk em gumanê di hebûna wê tekstê de bikin, anku tekstek ku di zimanî de di kûratiyê nagere, ew teksteke neşê bibe berhemek dî, berhemek ku mîna zimanek bihê li ser wî xwe çêke.

Sêyem: Damezrandina pirsyarên Şîmaneyî (Ferezî) wêzeyeke azad û berela, bêyî ku bibe binemayek bo rexneyek fantazî de bişê hemû sinorên tekstê; komelayetî mêjoyî, bê tirs bibire û li şûna wan sinoran asoyên bê domahî bixuliqînin. Anku rexne bibe berhemek mîna tekst ku li hember aqilîyeta hemû û sepa wek hêzek derkeve û ji wan kontîrol û qediye û hukmên mana û ciwanî tekstê azad bibin.

Çarem: Têkişkandina berhemên pir mana û aqlanî, hikomet, cihan, diyayên diyar, aşekere û damezirandina diyayek fantezî, azad û reha derbazbûn ji her hikomet ku tekst pêşkêş dîke. Her manayek ku pêşber dîke bi wizeyek fantazyane di zimanî de bêyî ku wateyekê bi tekstê bide.

Pêncem: karekterên nivîser û rexnegirî bi wêneyek nû damezirîntev, wekû Bart: dibêje nûbûn tawanê binerêti rexneyî nû nîne, belku tawanê rexneyî nû eweye keser ta pê rexne ye rol û dewrekanî nûser û rexnenûs bi şêweyekî nû diyarî deka 10- binêre rolan Bart, rexne û heqîqet û: Îsmâil Ziraî, berperê 37-ê.

Şeşem: Fantaziya dişê li ser tekstê berhemek dî çêbikê ke bi tamamî xwe li system, bawer, ciwanî û cîhana tekstê dabibire û tekstê bîkujê. Li şûna wî, fantaziya cîhana tekstê wird û xaş bike û peywendiyên nû û xweser ji desthelata nivîserî çêkite ve. Anku berhemê rexna fantazî xwendin û lêgeryan nîne li manayên tekstê, belkî têkşikêndina wan maneyane, ku renga li şûna wan maneyan, hindêk manayên nû xelq bike. Yan xelq neke, têkşikandin xemê serekî fantezyayê ye ne wek çêkirin û dirûstkrin, anku di vê derê de fanteziya wizeyek wêrankare bo tekstê, wizeyek xelaq bo berhemê rexneyê, berhemek ku heta duwa sinor bişê cîhanên cûr bi cûr çêbike û têk bişkênite ve. Cîhanek berdewam li berdem egerên xirabkirin û wêrankirin û herifîntê de bibe.

Bo pitir rohin kirin:

Karekterên Miryemayê "wek her romanek dî ku karekterek yan pitir hebe" ne

wek tine Miryema, hemû karekter, dişên nameyekî yan çendîn nameyan bo nivîserî yan bo hevdu binivîsin. Yan her hunerek dî bo peywendiyên helbijêrên wek fanteziya dişên di gel hev peywendiyê bikin û di gel hev dinyayek dî û cîhanek dî çêkin, bixuliqînin, biherifirînin û li ser yek mana, yek دنیا û yek cîhanê nerawestin. Anku her kesayetiyeke bişê xweser ji dorhêlê romanê derkeve û bi serê xwe bê kontorola nivîserî yan kesayetiyeke di yên romanê bo xwe rêyek dî bibînin, anku yaxîbûnek û wizeyek bo têkşikandina wan desthelatên manaya bi rengê xweser û bihê kontrolkirin, bo nimûne Miryema dişiya di nama xwe de yan di nameyên di de, dehan û sedan rexneyên dî wek çawan dişê destxweşî û piştgiryan ji pêşkêşî nivîserî û xwendevanan bike. Pişka giring di vê rexneyê de ewe ku karekter, bi temamî ji bin desthelat û manayên nivîserî derkeve. Bi rengê ku nekeve di bin karigeriya rexnegirî jî, anku ew “mana ciwanî û desthelata nû” ku di berhemê rexneyî de çê dibe dîsan ew jî qabilî têkdan û xaporkirin û wêrankirinê dibe. Anku wêrankirin pirosesek bê domahî be, di berhemê rexneyî jî de, anku bişê hinde xweser bibe ku wek semboleke destpêkê ji nav rexnegirî jî yaxî bibe. Anku di nav xwe de egerê herifandin û wêrankirina bihayên rexneyê bi xwe jî helgire. Bo wî jî ev cure rexneye pitir ji rohê şîirê nêzîk dibe ne wek metodên rexneyê, yan di barek baştir de, dibe rexneyek têkel ji rohê şeirê û metodên rexneyî, anku barkirina rexneyî bi rohek şîiriyane.

DESTPÊKEK DÎ JI ROLAN BART

MÎTA ZIMAN BI KURTÎ

“Dinya heye û nûserên qesî xwe yî deka. Edebiyat ewe ye, babetî rexne hindek ciyawaz e. Ev babete دنیا nîne, belku peyv e, gotina kesekê dî ye, rexne rexnegotin li ser gotineka dî ye, zimanê duhemîn yan wek lojîkzanan delîvên, yan zimaniyeke li ser yekem “ziman-babet” peyde dibe”¹¹-binêre rexne û heqîqet Rolan Bart û Îmail Zîraî, berperê¹³.

Metodên nijyargerî û helweşîngerî dişên wek rexne mîta ziman bin, zimanek raveyî ku li ser zimanê têkstê ava dibe. Mîta ziman, ser bê manayê û bê dinyaya zimaniye, anku yekem bê mana û yekem bê دنیا û duhem bê mana û duhem bê دنیا, mana nebûn û دنیا nebûna yekem û mana û دنیا nebûna duwem fantaziya mîta duhem û sêhem bê manabûn û bê dinyabûne. Anku bi rehendek dî diçe ser mîta ziman jî, anku rizgarkirina zimanî ye di rexnê de bo astek nûtir û serwertir ji mîta yekem, mîta duhem, xelqkirina mîta duhemîn têkşikandina mîta yekem e bi mitayek serotir û bilintir. Têkşikandina raveyan û gotinên yekemîn û duwemîn jî, anku heger deq yekem peyv bibe, rave duhem peyv bibe, fanteziya sêyem peyv e.

Nimûneyek bo rohnkirinê:

Heger “keçînî” bi girîmane wek yekem peyv wergirîn, “pîrozbahiya keçînî” wek rave wergirîn, ewe “ne pîrozkirina keçînî” dibe fanteziya.

Heger min bo nimûne di nameya Miryemayê de gotiba “ez çûm û min şûyî bi her kesek bêkir, ku zanî ez neçûm û jinim, çinkû li cem wî keçînî û jinayetî du têgeh bûn wî ne dinasîn, guh lê nebin, jê azad bû.” Ew azadbûn fantaziyet, mîta duheme ji mîta yekem serwertir e.

Mîta yekem dişê keçînî di çend astenga de destnîşan bike:

1- Keçînî di rewşenbîriya kurdî de pîroz e.

2- Keçîni di rewşenbîriya nivîserî de lenete.

3- Keçîni hêmaye bo cesteya welatî, cîhanê, her bo nimûne.

4- Keçîni hêmaye bo ji destdana payekê û pakizeyiya dinya û hemû mirovayetiye.

Destnişankirina çend astengan bo “keçîniyê” ku em dişên bi şêwazek pozîvîstane di pêkhatayên rewşenbîriya kurdî yan di felsefê de, yan di raveyên cûr bi cûr de peyda bikin, lê ew tiştê em neşên peyda bikin ew e ku em di binema de, çi maneyan bo keçîniyê nehêlin û ji hemû wêne û hêmayan azad û reha bikin. Keçîni dinya nebe, mana nebe, tinê peyv bibe û vala bibe ji hêma, wêne û manayan.

Xwînerê hêja ewa te xwend kurtebasek destpêkiye, sebarete fanteziya rexneyî, hêş ser û simayên wî bo min jî bi temamî û kamilanî diyar nîne, hêvîdarim rexnegirên deverê bişên alîkarbin di zengînkirina babetan de, di projeyên bihê de hêvîdarim bişêm pitir û dirêjtir li ser rawestim.

Jêder:

1- Dr. Osman Emîn, mişkile el huriye fi felsefet Kant, kovara el Hilal berberê 54-68, bedaxwe jimareya kovarê li ser nemaye.

2- Eqil îdan, el niqod û tesis el eqlaniye, el hîwar el mitemed, jimara 1509 roja 3/4/2006.

3- Ramîn Cihanî gul, ramanî Higiîlî çend waneyek le mer fenomenolojî rûh “diyardenasî zeyn” wergerana Îdrîs Şêx Şerîf berberê 7-9.

4- Pîr vî, zîma helweşanegerayî, lêkolîneweyekê rexneyî, wergêranî: Rêbîr Resûl Îsamîl, bi taybetî berperên 34-41-ê.

5- Merîwan Wîrya Qani felsefe, Îslam û roşengerî, welamêk bo kitîbêkî mela Bextiyar li bilawkirawekani Navendî Rehend bo lêkolîneweyî kurdî.

6- Nijyargerî, Fazil Omer, ji weşanên Yêkîtiya Nivîserên Kurd- Duhok, jimare 40.

7- Merîwan Wîrya Qani felsefe û îslam û rewşengerî, welamek bo kêşeyekê mela Bextiyar li bilakirawekani Navendî Rehend bo lêkolîneweyî kurdî.

8- Hoşeng Şêx Mihemed, “Şeir û Xweda, şeir û şeytan” bo xwedanê dişên li ser sikrîna wan yan erşîva wan sayitan heyva yazde peyda bike.

9- Rolan Bart, rexne û heqîqet, wergêran Îsmail Zîrai, dezgayî wergêran 2007.

10- Her ew çavkanî.

11- Her ew çavkanî.